Li hamber valabûna gund, bajar, û bajarokan ji Kurdan, bendegihên Ereban(Xemir) ji nû ve têne avakirin, û guhdan bi rewşa wan dibe, û pirojeya Mihemed Teleb Hilal tê cîbicîkirin, û mixabin li ber çavên rêxistinên Kurdî yên siyasî roj bi roj ew berfereh dibin, û metirsîk mezin çêdike ku di qonaxa bê de ew bibin xwediyên xakê, û Kurd bibin yên biyan, tevî ku derfet zêrîn bû ji bo vegerandina wan li warê wan yê resen!.

Axavtin li ser rewşa Kurdê Kurdistana Sûrya bi dawî nabe, nemaze piştî evê derfeta dîrokî ku jê re peyda bû. Ev derfeta ku hêvî çêdikir bi peydakirina buharek xweş û geş li şûna payîzeke xemgîn.

Ji bo hin geşbînî bi pêşerojê û çareserya pirsgirêkên

Luqman Yûsif

navxweyî, pêwîst e hemî rêxistinên siyasî li xwe vegerin. Evan nakokiyên bê sûd û beyhûde ji nav xwe rakin. Armanca xwe bikin bidestxistina mafê gelê xwe, nema berjewndiyên partîtî û kesayetî di ser kêşeyê re bigrin, li ser bingiha berjewndiya gelê Kurd bi rengekî biratî, û şêweyek şehristanî kar bikin. Bi vî rengî hêvî bi hatina buharê re çêdibe û berevajî wê payîz li pêş e!.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Reşkirina Rastiyan



Ferîd Mîtanî

Ji bêyî ku em çi dirûşim û siloganên beloq binivîsin, helbet rola jinê di jiyan û civakê de girîng û berbiçav e.Tu zayend ji bê ya din nabe, berevajî vê yekê her du êk û din tekûz û temam dikin.
Ji bilî cudahiyên gewd û fîzîkî, bê guman di stûbarî û erkdaiyên jiyanê de her timî giraniya karê jinan li hember yê mêran wekhev û hevseng e, eger di cînan de erkên jinê ne girantir bin.
Xweş tê dîtin ku jin maka jiyanê ye, fêrker û dibistana her curerengê rêzik û rêbazan e.
Ez divêm li ser rewşa jina Kurd di dema heyî û çûyî de, û lîstina rêxistinên konevanî li ser pêla hestan biaxivim.
- "Jin wiha. Jin wilê . Bi vî rengî hatiye pêlêkirin. Ji hizir û bîrên xwe ve hatiye pûçkirin" !.
Ez benî , bêhna xwe bîstekê vede, tu êdî hew di gola nezan û belengazan de avjenîyê dikî. Mirovê deng bike dê bibêje ku jina Kurd ji roja xwe ve li nêv hov û hirçên dirinde jiyan dike, mixabin beloqbûn û xwehetikandina eşkere ji aliyê rêxistinên me ve her di gera berdewamiyê de ne.
Ger em bi lêgerîneke zanistî û dîrokî li jiyana jina Kurd bikolin û bi çavên rastiyê binirxînin, helbet dê xweş diyar bibe ku jina Kurd di hemî serdeman de ne kêmtir ji mêr serwerî û pêşengtiya serdemê ta astekî kiriye û pê re dê angaştên van mafnasên pispor vala derkevin.
Ji xwe me Kurdan qet jiyan, bûyer û bûyinên xwe tomar nekirine lê di berhemên dîrokî yên cînar û rojhilatnasan de baş li ser jina Kurd hatiye axaftin û gelek rastî hatine belgekirin.
Di pirtûka gernasê Turk Ewlîya Çelebî de rastiyek tê holê ku di serdema Osmaniyan de jina Kurd a bi navê Xanzade Sultan mîrîtiya heremên Herîr û Soran dikir û bi çelengî hukmê xwe dewam kir.
Her wiha Qere Fatime Xanim bi Siwara Efsanewî li nêv bîyaniyan dihat binavkirin, ev jî siwar û serwera Kurd e ku di Şerê Qermê de pêşengtiya 40 hezar şervanên Kurd dikir û di şerê xwe de gelek pêlewan û fêris bû.
Li qada sîyasî jî jina Kurd bi xurtî xwe raberî cîhanê daye û navê xwe di bîrdanka konevanî de nemir hêlaye. Jina bi navê Edle Xanim demeke xweş rêvebertîya Herêma Erdelanê kiriye û gelek caran li dij Osmaniyan serî hildaye. Leyla Zana bi cesaret û zanebûna xwe û bi palpiştiya gel digihe perlementoya Turkiyê û bi (Şaha Kurdistanê) tê binavkirin.
Sefîye Xatûn jî mîrzadeya Kurd e . Mîrîtiya Minbicê dikir û di dema xwe de nav û xebatên wê li her deverê li kar bûn.
Di warên mîrîtî, rêveberî û pêşengtiyê de bi dehan jinên Kurd di van her çend sedsalên borî de roleke girîng lîstine, belgeyên Osmaniyan yên bi navê(Qanûname) û gelek berhemên gernas û dîrokzanan vê yekê tekez dikin.
Bê guman eger ji alîyê zayenda mêr ve pejirandinek nebûya tu caran ev serweriya jinê ne pêkan bû.
Derbarê huner û mozîkê de jî, ez bawer im çi gava li ser kultor û hunera Kurdan tê axaftin, di cî de Meryem Xan, Eyşe Şan, Sînem Bedirxan û Sûska Simo tên bîra mirov.
Ne tenê wiha, lê belê rengê jinê di hemî curesitranên Kurdî û di wêjeya gelêrî de li pêş e.
Her timî jina Kurd di lawik û goraniyên Kurdî de helbestvan, cebeng û axêver e. Gelek mînak di vî barî de hene, wekî: Hefsedê (Edûlê) hevjîn û dotmama Gênc Xelîl, Binefşê yara Cembelî, Fatima dotmama Elo, Xatê dayika Silêmanê Mistê, Goza dayika Emo û hwd…
Di warên rewşenbîrî de jî tê xuyakirin ku bi sedsala 20'an re hestên netewî li bal Kurdan pêşdetir dibin û êdî nivîskarên kurdînivîs çêdibin, di heman demê de jina Kurd jî pênûsa xwe hildigire û kirasê olî û nezanîyê diçirîne û hizra xwe di rêya xamê re bi Kurdîyeke resen belav dike.Ji wan jinan dayîk û Mamosteya zimên Misrî Xan ku di dibistanên Komara Mehabadê de fêrkirin û berhem didan. Her wiha Rewşen Xan û Dêya Ciwan jî rengekî nazdar û balkêş li tûrika wêjeya Kurdî bar kirine.
Tu caran ol û bawerîyên Kurdan ên dêrîn û kevn çi binpêkirin dermafê jinê de nekirine, lê ji ber wekheviya di navbera her du zayendan de ,ev mijar nebûye cihê gengeşeyê.
Helbet baş tê zanîn jî ku xwedawendên Kurdan her ji rêgeza jinê bûn û di warê efsaneyî de jî jina Kurd cihekî pîroz girtiye û Şahmaranê mînakeke diyar e.
Di warên jiyanî û malbatî de her û her jina kurd rêveber û serdesta zar û mala xwe ye ,wekî hevjînê xwe dibe kar û peywirên wê ji derveyî malê hebin û ev yek xweş xuya ye li nêv me ji kevin ve.
Divê em jibîr nekin ku aboriya malê ji hemî aliyan ve di destên xanima malê de ye. Ji milê xwendin û rêdana wê ji aliyê malbatê ve, car dî çawa law di zanîngeh û fakulteyan re derbas dibe, keç jî bi serbestî xwendina xwe ta astên herî bilind dewam dike.
Ne tenê jin, lê belê miletê Kurd bi giştî di dirêjahiya dîrokê de mafê wî hatiye xwarin û rast li dagîrkeriyeke bêhempa hatiye.
Civaka Kurdî sîyaset jiyan nekiriye û ji vê yekê her di kirasê xwe yî kevnar de li paş maye û çi destkeftên berbiçav bi dest neêxistiye, ev yek dibe sedema qelsîya xwerêvebirin û biryardayinê li bal Kurdan. Anku di vê yekê de jin û mêr hevpar in.
Car dî tekez dikim, ku çi beşên jiyanê yên heyî û di kîjan serdemê de bin jî jina Kurd bi xurtî beşdarî lê kiriye.
Ev rastiyên jorîn tu caran nabin rêbend û sitargeh ji nîr û kevneşopiyên ol û êlî re, bi sedema ol û têkiloiya bi neteweyên din re, êdî Kurdan jî hin rêzikên nû li jiyana xwe bar kirine.
Bi vê yekê jina Kurd di hin rewş û deman de lê hatiye nihartin wekî amûreke zayînê bi tenê, her wiha barhilgira namûsê jî.
Lê car dî eger em danberheviyekê di navbera Kurd û cîranên wan de çêkin, dê baş zelal be ku jina Kurd di çend salên dawî de bi serbestî wêrekî û xurtîya xwe li cîhanê temamî ragihand, ev jî dibe palpişt ji wê yekê re ku ev jina serwer saman û mîratekî xwe yî xurt û kevnar li nêv civakê heye.
Bila hew mêrxasên konevan xwe bikin felatkarên vê jina leheng, ji ber dîrok û boriya jina Kurd cihê wê yî girîng li nêv Kurdan piştrast dike.
Dibe ku partî ji ber mebest û armancên tevlîkirina endaman li nêv refên xwe hin dirûşmên rêzder bavêjin, lê nabe ku mijareke girîng bi temamî ji çarçoveya rastîyê were derkirin.

Kurdên Reş.. Kurdên Spî û Kurdên Keskesor

Mahabad Felat Arda

Kurdên reş, her çendî reş bin jî, xwedî dil û Kurdayetiya herî pak û pîroz in. Şervan in, kedkar in, fedakar in, jinxas û mêrxas in, barkêş û canfîda ne, evîndar in, ewçendî ku tu carî ji bo xwe tu tiştekî naxwazin û ev di serê wan re derbas jî nabe. Kurt û kurmancî, em hemî rûmeta xwe û ya welatê xwe deyndarê van Kurdên "reş" in.
Kurdên reş, bi tenê di nav Tevgera Azadiyê de têne dîtin û hew!
Kurdên spî: Navê wan spî be jî, dilê wan jî, ruyê wan jî, jîyana wan jî û tişta xweş ku kêfa mirov tîne, paşeroj û pêşeroja wan jî reş e. Ew bela serê vî gelî û hemû mirovahiyê ne. Gemarî û qirêjiya vê jîyanê ne. Bêhna wan genî ye, wekî giyana wan, wekî mêjî û dilê wan.
Kurdên spî, navê wan spî be jî, tu rengek ku negirin, tu kirasek ku li xwe nekin tuneye. Zikê wan berê wan bide bi ku ve, ew li wir, di wê kirasê û di wî rengî de ne.
Kurdên spî, ji bilî Tevgera Azadiyê, li her derî bi hêsanî dikarin bêne dîtin!
Kurdên keske-sor; Rewşa herî xerab ya wan e. Lewra ev Kurdên li Erafê ne. Ne bûne Kurd û ne bûne Tirk û Ereb û Faris! Jixwe dema nebûne xwe, nikaribûne bibine tu tiştekî jî, lê ew vê rewşa xwe di bin navê "biratiya gelan" an jî "biratiya olî" (çiqas van gotinan dibihîzim kena min tê) de dinuxumînin, lê dîsa jî ji vir û wir ve der dide û ew her diqilqilin ji bo nedine der. Ne ji dêrê re bûne ev camêr, ne ji mizgeftê re û jixwe nikarin nêzî Laleşê jî bibin.
Bikevin nav çi civakî, wê civakê dixitimînin, lewra ew nebûne xwe û di xwe de xitimîne.
Ev Kurdên keske-sor çendî bi piranî xwedî niyetek baş bin jî, bela serê vê şoreşê û vî gelî ne. Lê ji ber niyeta wan, ne têne berdan ne têne lêdan.
Kurdên keske-sor di nav Tevgera Azadiyê de jî û ji derî Tevgera Azadiyê jî dikarin bêne dîtin. Lê benê ku wan girê dide mixabin ne werîs lê tayîk e, loma diyar nabe dê kengî bi ku ve bivirvirin!
Li gel rêz û silavên min, bi tenê ji Kurdên reş re!

Rewşa Kurdî

Zahid Xelef

Doza Kurdî di Rojhilata Navîn de ango çarenûsa gelê Kurd di sed sala bûrî de hat paşxistin, veşartin ji Rojeva siysî a hêzên xwedî rol û bandor ê navdewletî û herêmî ketibû gerewa bend û milmilaniya şerê sar de di navbera hêzên Rojavayî de Emerîka û hogirên wê û yên Rojhilatyî de Sovyêt û hevalbendên wê.
Evan hêzan siyasatên xwe ava dikirin li ser lihevkirin û dabeşkirina Berjewendiyan, Bi wateya ku hemiyan dixwest hevteraziwa herêmê ava bikirin bi razîkirina dijminên Kurd, dagirkerên Kurdistan û perçiqandina mafê gelê Kurdî netewî dûrî hoy û pirinsîp û bingihên mafê mirovan.
- Rojavayê Kurdistan wekî beşên din ji Axa Kurdistan di heman rewşa zehmet de dijî .Di bin zext û gefên tunekirinê û pişaftina qewmî û civakî de.
- Lewra em dikarin bêjin ku delîveya kar û xwebirêxistinê bo tevgera Kurd a ku nû dihat damezrandin paşî sazkirina yekemîn partiya Kurdî di sala pêncî û heftan de teng bû bi zor û zehmetî bi rê ve diçû bi ringekî veşartî tevlî ku programê Tevgera Kurd li sûriyê ragihandî ser alavên siyasî û aştiyane ji ber ku bi ti şêweyî şofînîya partiya Be'es navê Kurd ne dipejirand şerekî dijwar di rû mafê gelê Kurd de di meşand ne dihêlaşt Kurd bêhina xwe berdin hemî pirojeyên nijad perestiyê li ser qada Kurda pêktanî ji şerê nan heya şerê guhertina dîmografî û qedexekirina ziman û çanda Kurdî -Li vê derê Em dikarin bêjin ku gelê Kurd bi tevgera xwe û pêdariya xwe a bêhempa dikarîbû li ber xwe de hinekî xwe biparêze ta îro,lê cihê derb û zexit û gefan di gewd û pergala siysî de xweş xuya ye dimîne û em dikarin amaje bikin ku ne lihevkirina siyasî encamek ji bandora tevlîhevî û nakokiya ku dijmina bi pilanên xwe çandiye û hêjî berdewam e.
-îro neyarê Kurd li ser wan xalan ava dike nimûne perçekirina ji partiyekê ta ku bû tevgerek ji partiyan ji hejmarê ketiye hemî bi sedemên pûç yan jî nedirist xwedê giravî fikrî û ne wekheviya nerîna, ev perçebûn bû lawazî û nexweşiyeke bê dermanÛ bê wate û barekî giran davêje ser naveroka doza Kurd û bere kes ne bêje ev saxlemiye di nerîn û bîr û borçûna de dîmoqrasiye û di baweriya min de dibe ku encama pirogramê siysî yê lawaz be û di cîna de ne jîwerî be, yan jî milmilaniya kesayetî û malbatî be çav ne barî û xwestekên kesane be da ku her yek bibe sekretêr bo hin berjewendiyan ji ber ku pîvana serkeftina her tevgera siysî ewe ku li hev be xêzên qalind di navbera wande peyda bibin da karibin çarenûsa milet bi çesipînin nexasim di vê demê de a ku di xewnên şeva de kesê Kurd bawer ne dikir peyda bibe .
-Lê mixabin me dît ku Kurdê Rojavayê Kurdistan ti ezmûn wernegirtine mafê miletê Kurd bi miletê di Sûriyê de nedane naskirin û ew kes û aliyên ku digotin dostê me ne dijminê herî dijwar in ji mafê gelê me re ne û ji dêvla ku tevgera Kurd vê derfeta mezin qezenc bike goştê xwe gez dike têşîne li hevdigere xwe tewanbar dike ji bîr dike ku dîrok rehmê nake û derfet ne her dem peyda dibe.
-Di vê sergêjeka ku tevgera siyasî a Kurd tê de dijî em ê li çareseriyê bipirsin li hin xalan xwedî derkevin bavêjin Rojeva bûyerên siyasî: Ew in ku heger siyasetmedarê Kurd ji destpêka rûdanên çêbûyî de karîba baş binirixênin ji nav hev derxistiba bê ka kî ne ewê doza guhertinê dikin di Sûriyê de nemaze paşî ewan çend heyvê destpêkê û dîse nemaze dema hin islamiya ketîbên şer ava kirin di bin imreta Mîta tirk de û paşî ku Serêkaniyê rastî gef Û êrîşa hat ji aliyê wan girûpê ku li ser Artêş Azad qaşo dihatin hijmartin; hingî divabû helwesta hemî partiyên siyasî ji şoreşa Sûrî hatiba zelalkirin ango berê bûyera hat guhertin di bin bandora dewleta Tirk û şofînîyên Ereb û islamiyê tundrew de û ya rast ew bû ku Tevgera Kurd xwe daba ser hev û bûba terefekî serbixwe ne ketiba hundirê ti komika bi navê rikberiyê, wê demê dikarîbûn devera xwe biparêzin xwe bi rê ve bibin bi hev re û a herî baş ew bû dûrî îdyolojiya vi alî yan aliyê din ketiba di cewherê mafê gelê Kurd di Sûriyê de lêpirsîn û danûstandin kiriba û îro heger Kurd bi xwe ve negihun li xwe nevegerin dibe ku qelen buha be Ji ber vê yekê pêwist e gotara tvgera Kurd nêzî hev bibe û ji bo hemî aliyê ewlehiyê bi hev bînin giring e devavêtina li ser ragihandinê betal bibe tewanbariya ji hev re rawestе girtina siysî nemîne kar bo kongirekî giştî ji tevgera gelê Kurd a Sûrî re were vexwendin di bin çavdêriya hêzên Kurdistanî de.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Çand Tovê Civakek Resen û Pêşketî Ye

Xoşman Qado

Çand hîmê sereke ye bo avakirina civakek têgihiştî, çunkû têgiha çandê alîkariya mirovatiyê kir ku gellek pêşketinên mezin di warê zansitî û ramanî de pêk anî. Çand wekû têgih bi xwezayiya xwe avakiriye li ser kombûnê û ew her tim berdewam e, ew ne girêdayî serdemek dîrokî ye, ji ber ew paşmayiyek civakî ye û ji hemî deskeftiyên mirovatiyê re ye.
Di rewşên şer û pevçûnan de tenê çand dikare civakê ji wêranbûnê biparêze, ji ber ku çand mîna mertalekî li hember hemî hewildanên jihevxistina civakê radiweste, û her tim dibe çiraya ku rêya pêşketinê ronî dike da ku mirov girêdayî êşa xwe be.
Divaye ku rola çandê di xurtikirina têgihên mîna jiyana hevbeş û aştiya navxweyî de geştir bibe, nexasim dema ku nakokî û pevçûn di civakekê de li dar be. Ezmûneke baş aniha li ber çavan heye, ew jî ezmûna Sûrî ye, ku aniha rewşa Sûrî ya ku tê de dijî avakirî ye li ser têgihên bereyî û bihevpevçûnên di warê gotin û ramanên tund de yên ku civaka Sûryayê tev de ji xwe re kir armanc û rê li pêşiya nehezkirin û kînê vekir çaxa ku jîngehek guncaw jê re peyda kir.
Civaka Rojavayê Kurdistanê ne dûrî bandora civaka Sûrî bû, ew jî bi awayekî nêzîkî rewşa nakokiyê bû, lê asta nakokiyê cuda bû, ew jî, ji ber ku civak ber bi rewşek aramiyê ve hate meşandin. Ji bilî nakokiya siyasî û bikaranîna hindek simbolên pîroz di civaka Kurdî de bo berjewendiyên kesayetî nakokî nebû çandek di nav civakê de, çi ku hebûna sazî û rêxistinên sivîl û yên rojnamegerî û yên çand û nivîskaran nehişt ku civak bikeve bin bandora nakokiya siyasî de, tev li ku hîn jî ev sazî û rêxistin bi erkê xwe – wekû ku tê xwestin- ranebûne, lê bi roleke erênî di vê qonaxa aloz de lîstin.
Parastina çandê parastina gel e, çi ku çand hizir û bîreweriya wî gelî ye. Çaxa ku çand jî mîna zindîwerekî tekûz di nav civakê de cihê xwe bibîne dê hişyariya wê civakê jî di astek pirr pêşketî de be. Ji ber vê yekê jî gerek em bighêjin wê baweriyê ku di civaka Rojavayê Kurdistanê de gellek netewe dijîn û divaye ku çand pira van neteweyan be da ku em bikaribin rûdêmine nû bo paşeroja vê civakê destnîşan bikin, di rêya peydakirina landikekê ku bibe bingeh bo pejirandina yê dîtir û geşkirina rola çandê bo avakirina civakekê ku hîmê wê rûmeta mirov be.
Îro roj pêdivî bêhtir dibe ku rewşeke nû bo hevgihandina ramanan peyda bibe, ramanên ku dikarîbin siberojekê çêtir ava bike, ku mirov tê de hîmê sereke be, di rêya tekezkirina rola çandê re da ku bibe zimanê gotûbêjê di navbera hemû pêkhateyên civakek westayî de ku ev bi dehê salan e di bin desthiladariya nijadperest û şofînistan de bû; çanda ku her dem dixwaze bibe pira di navbera sînorên ku hîn jî mirov parçewerçe dike û wî dûrî xwezayiya wî dibe. Çi qas rola rewşenbîran di geşkirina civakê de sereke be em nikarin barê vê geşkirin gişî jî biavêjin ser milê wan, çi ku hewildanên pêşketinê bareke komî ye hemî kes divye ku tê de beşdar bin, rewşebîr, siyasetmedar, bazrigan, û karker jî.

Gelê Şîkaxoyê Ji Tirşikê Gelekî Hez Dike

Du ciwanên Mêrdînî yên ku li Şîkaxoyê xwedî xwaringehê ne, behsa xebatên xwe dikin û diyar dikin ku Kurd ji ber şerê xwe yê li dijî DAIŞê ji aliyê Emerîkiyan ve gelekî tên naskirin lewma jî ew çand û hunera Kurdan meraq dikin. Herwiha kêfa wan ji xwarinên Kurdan jî tên ku wan ji tirşikê gelekî hez kiriye.
Mehmet Beşir Yavuz û Mehmet Duzgun herdu ciwanên ji Mêrdînê, li Şîkaxoya Emerîkayê pêrgî hev tên û biryara vekirina xwringehekê didin. Piştî lihevkirina herdu ciwanan li ciyekî herî navdar ê bajêr xwaringehê vedikin ku li vir xwarinên Kurdan çêdikin. Yavuz û Duzgun navê xwaringeha xwe jî dikin The Gund's Kurdish Kitchen yanî 'Xwaringeha Kurdan ya Gelê Gundiyan.
Mehmet Beşîr Yavuz derbarê xwaringehê de axivî û amaje kir ku ew dixwazin bi rêya xwarinên xwe çand û hunera Kurdî bidin naskirin û navê Kurdan li Şîkaxoyê bilind bikin.
Xwaringeha Gundiyan
Mehmet Beşîr Yavuz diyar dike ku gelek Kurd hene lê ev kes xwarinên miletên din û bêhtirê wan, xwarinên Tirkan çêdikin û wiha pê de diçe: "Dema ku me biryar da em vî karî bikin, me got bila tiştekî li ser Kurdan be. Ji ber li vê derê restorantek li ser navê Kurdan nîne. Em ya yekem in. Ji ber peyva ku 'gundî' jî di nava Kurdan de gelekî tê naksirin ku germahiyek vê gotinê heye me navê restoranta xwe kir The Gund's Kurdish Kitchen "
Kêfa Gelê Şîkaxoyê Gelekî Ji Tirşkê Re Tê
Dema ku em hin pirsan li ser lîsteya xwaringehê dikin Mehmet Beşîr jî ji tirşika bacanan bigrin, goştê sêlê, pel û dolmeyan heta kutilkên Mêrdînê qala gelek cure xwarinan dike û dibêje: " Em di hemû rojên taybet de kutilkan çêdikin herwiha li ser daxwaza muşteriyan jî tê çêkirin. Li Şîkaxoyê hejmara gîhaxwiran gelekî zêde ye, ji ber vê yekê tirşika me ya bêgoşt bi wan xweş tê û gelekî jê hez dikin û dixwin".
Beşîr di dirêjahiya axaftina xwe de behsa eleqeya li hember xwaringehê dike û dibêje li gel ku wan xwaringeh nû vekirine dîsa jî li bajêr gelekî hatine naskirin ku ev eleqe wan şaş kiriye.
Ketin Lîsteya Baştirîn 14 Xwaringehên Li Seranserî Emerîkayê
Beşîr wisa jî dibêje:" Em di nava çend roj an de gelek hatin naskirin. Emerîkî Kurdan ji şerê li dijî DAIŞê gelekî baş nas dikin û wan meraq dikin. Ji ber vê yekê dema me restoran bi navê Kurdan vekir eleqeyek baş li hember me çêbû. Rojnameya Şîkaxoyê Tribune me kirin nûçe. Her wiha em ketin nava 14 restorantên li Emerîkayê yên nû hatine vekirin ku tên pêşniyarkirin.'
Di dawiya axaftina xwe de pêşniyariyê li ciwanan dike û dibêje pêşveçûn girêdayî xebat e û wiha pê de diçe: "Bila Kurdên me bixebitin lê bila ti caran xwe jibîr nekin. Lewra em çiqas navên xwe bidin pêş em ê jî ew qasî pêş ve biçin".

Dixwazim Wek Xwe Bijîm

Cîhan Hesen

Sîberên vî welatî tev bi rengê eşqê çirûsik didin, wisa her sibehê hilma evînê ji berbanga welatê agir û rojê tê. Li vir tevî em pir êşiyan, pir kes ji me çûn, derd zêde bûn, azar di çavên zarokê me de xuliqandin û xwestin kenê zarokên welatê min di zivistaneke bêxewt de û di bin çengên dayikên wan de bitefizînin, lê gava ku aşqên vî welatî sibehan ji hembêza Rojava bi xewên rûbiken çavên xwe vedikin û fincana qehweyê li ber awazên Eyşeşanê guhdar dikin, hinekî navê şoreşê bi xwe re digerînin.
Ez jî her sibehê çavên xwe bi xweşikiya kesesora Mîştenûrê têr dikin, dizanim hinek jî bi bilindahiya Cûdiyê Miradan miradên xwe her sibehê nû dikin û hinek jî bi çiya û zeytûnên bejin quntarî vedikin. Çiqas hêviyên kuştî ji koka tirêjên sibehan li vî welatî şewq didin wê demê, çendîn kesên çûyî ji bîra qederê dîsa serî radikin û xweşiya vî welatî re xweşik dibin. Ma ez ê çawa ji vî welatî hez nekim ku bêhna dayîk, bav, bira xweşik û hevalên min ji axê wê her sibehê difûre rûyê min î xilmaş û bi hezkirin min hişyar dike, bi wê bêhnê ji malê derdikevim. li kolanên hilweşiyayî bi keser dinêrim. Beriya ku hêsir çavên min bixapînin, çavên min wê dixapînin gava ku dayika şehîd Agirî, li ber derî dibînim, ku tevî êşa kezebê ber deriyê xwe bi hezkirina welat paqij dike, çavên ku wê bibîne silavan lê neke gunehkar dibe, lê çavên ku bi ken sibeha wê bixêr bike, baxçeyên hêviyan ji wê distîne, roja xwe bi xweşbînî berdewam dike. Erê ya min jî ew dayîk e ku roja min bi hêviya xweşiyê derbas dibe , ji ber ku lavayên ji pajiqiya dilê dayikên şehîdên welatê min derdikevin mîna ayetên xwedê pîroz in.
Bi gavên xwe re dibînim ku em hîna bi bermahiyên şer re dijîn, li koşeya her kolanê bîranînek, êşek û keserek nefesteng heye. Dibe ku pir kes wek min ji sibehan çavên xwe vedikin û di riya kar de diçin, beriya ku ew li ganzicên milet ên bêdawî guhdar bikin û li qîrîniya neraziya vê jiyanê guhdar bikin, hinekî bi sibeha welatê xwe şad dibim, wê çi bibe ku sibehekê mirov bi eşq rojê pêşwaz bike. Ez jî bi vê heyecanê ji mal derketim û min berê xwe da kar ,gazinc û nerazîbûn wê sibehê ji mêjiyê min derket bû. Heta çend kolanan ji wê dayikê û bi wê moralê dûr ketim, li cîranekî xwe rast hatim, beriya ku ew rojbaşa min vegerîne, wî ji min re got: Cîran ka îro mazot nehatiye zarok duh ji serman re nexweşbûn, ma di vê rewşê de em ê çawa bijîn.
Ez ne berpirsyarê gaziyê me û jî nizanim sedema derengmayîna mazotê çi ye, nedikarim bersivê bidim ne jî dikarim nedim, hat bala min ku mazota malê ber qedandinê ye, divê ez mazotê peya bikim. Tenê bersiva min ji wî re ma, bi Xwedê ez jî wek te dijîm û min riya xwe berdewam kir, du kolanên din min derbas kirin, li nanfiroşê kolanê rast hatim, bi rojbaşa wî re jî min jê re got ku dema nan hat bila nanê malê jibîr neke, ji bo ku zarok werin bibin, lê beriya bêje erê yan na got: Bi xwedê heval çavên me derdikevin heta ku em nan distînin, hejmareke pir kêm didin me. Nanê em tînin jî bi zorê tê firotin, buha ye bi xwedê aboriya milet têra nake ku werin bikirin. Li wir ez bêdeng mam rast e her sibehê ez dibêjim: Gelo wê ez ê bikarbim sibeha were nên bistînim an na. Lê bersiva min ji wî re jî ma, heval ez jî wek va miletî dijîm aboriya min ne zêdeyî wan e .
Min riya karê xwe berdewam kir, heta ku ez gihiştim erebeyê. Ji bo ku biçim ser kar nakokî û rewşa vî welatî min ji hal kir bû, ajokar bi dengê radiyo û awazên Mihemed Şêxo (Azad e şîrîn) hinekî bêhna min fereh kir û bêhna welatê min ji min re anî, kêliyekê wek sibeha ku ez ji mal derketim di xweşiya wê kêliyê de li welatê xwe min dimeyzand û bi hebûna xwe ya ku di hembêza welat de mijûl bûm, gava ku ez ber parastina bedên kontirolê re derbas bûm, eşqa vî welatî xwe li min pêçand.Bes gotina ajokar min hişyar kir. duh komîna taxê dîsa navê me tomar kir, ji bo ku şekir ji me re bînin, lê em dizanin wê anîna pêdiviyên me biçe çend mehan yan were an neyê û em ê bê şekir wek meha çûyî bimînin li firoşgehan jî tuneye, ku li firoşgehekê hebe jî, lê pir buha ye, ez bi gotina wî mijûl bûm rast e îro ez ji malê derketim şekir tune bû ji min re gotin , dema tu hatî malê bi xwe bîne. Lê bersivandina vê pirsê li gel min tunebû, ji bilî ku ez bêjim, bi xwedê ez jî wek te dijîm, zarok li malê bê şekir in. Ajokar ez ji xweşiya welat ber bi kêmasiyên jiyîna di welat de birim.Bi wê piskolojiyê ez gihiştim kar. Di kar de rojbaşa ku ez bi zimanê xwe bi xweşlêvî dibêjim çiqas aramiyekê û kêfxweşiyekê dide min, min li demên berê vedigerîne ku berê bi zimanekî din ji kesên ku kirasekî din li çand û zimanê xwe kirbûn, tîne bîra min ku min, demên xwe bi keder bi wan re derbas dikir, wê demê ez bi navê şoreşê zêdetir hîs dikim û ji welat xwe zêdetir hez dikim û pê re dikenim, lê gotegotên ku ji dûr ve tên guhên min ku wek wan gotegotan her sibehê li ber guhên min dikevin. Ji min re pir zelal tên ku hevalên min ên li kar dibêjin: Duh civîna rêveberiyê bû, diviya rewşa me ya aborî nîqaş bikirana, belkî buçya me zêde bikirana, birastî di vî welatê tişt li ser hev nemaye û her diviya rewşa me ya aborî nîqaş bikirana, belkî muçeya me zêde bikirana, birastî di vî welatê de tiştek li ser hev nemaye û her tişt li suqê buha buye, ma bi vî meaşî(muçeyî)em ê çawa derbara jiyanê bikin, bixwedê kêm e ,her roj di civînan de nîqaş dikin lê bersiv û çare tuneye, de belengazo were li vî welatî bijî.
Ez bersivê nedim wê bibêjim ku aboriya xwe pir baş e ku ew jî wek me ji rewşê hêrs nabe, ku bersivê bidim wê demê ez ê xeyalên ku beriya ji mal derkevim winda bikim. Bersiva min dimîne ji wan re jî ez jî wek we dijîm, bes çare wek we gotî tuneye.
Ez baş dizanim ku mafê wan e, ji ber ku kêmanî pir in, ji ber ku ez jî wek wan im, lê ji mafê min e jî ku sibehekê ji van sibehên ku her roj dijîm bidizim û wek ku ez dixwazim bijîm.
Bêyê ku gotegotên kesî guhdar bikim.
Dixwazim êdî bi xweşiya şoreşê hîs bikim û wek xwe bijîm.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestin Bijartî .. Nêrgiz Ismaî'l

Nêrgiz Isma'îl, keça kurd, jina şoreşger, zaroka Rojavayê Kurdistanê ye. Di sala 1975'an de li bajarê Qamişlo çavên xwe li dinê vekir.. Ji zarokatiya xwe de bi pênûsê re bû dost û heval. Dibistana navîn li Qamişlo qedandiye.

FERATÊ

Ey Ferata şox û şeng
dixwazim wekî te,
keç
pak
kubar bijîm
strana jiyanê bixwînîm
bibim helbest
xewikim nav,
ax û pêlên te
bêkes nemînim
bibim têleke dilopê
bikevim bin,
piyê gihayê giyana
bikevim ser,
bihara şevekê
wekî bejna te,
bê ewir
bireqisim
tenê
firîn bibe
çemê herikîna min

Ger

Ger cîhan bi meznahiya xwe
bi pehnî û dirêjahiya xwe
bi lawir, dar, çol û şînahiya xwe
bi av..
Çem, û deryayên xwe
bi lehî, dehil û rezên xwe
bi xweşiya xwe
bi nexweşya xwe
bi xweşikî, bedewî û delaliya xwe
bi pirtûk, lênûs û pênûsên xwe
bi peyv, çîrok û hevokên xwe
têra cîhana helbesta min nekiriye
gelo wê qemçên destê te ên biçûk
têra çend peyvên azad yên helbesta min bike?



pêlên Îmralî

Dawiya şevê
digerîm li peyvan
belkî bêrîkirinê heydar bike
Lewra min nezanî ku şev jî,
li nav pêlan hedana giravekê dike
Gava dengê te
Ji wê giravê hat
Mîna herikîna çemekî,
peyv û şev bi xwe re herikand
Nava giyana helbesta min
Pêlên deryayê bi hêrs in
Xewa peyvan naynê
tenê xezeba kenê me
nifiran li wê giravê dike

Sibatê

Êrîş kirin wek guran
Hawareke wêran buyî ey felek
Karwanên mêrxas û leheng çûn ey felek
Li ber qontarên jana keldumana welat
Xwestin bi bazirganiyê lehengiya me bin ax bikin ey felek
Xwestin Rojê bikin rewrewk
Ronahiyê vegerînin wek xweliya goristanan
Îro roja kêferat û berxwedanê ye
Roja cengê û serhildanê ye
Ne roja binketin û sernoşanê ye
Ev ne mirina meyî gelemperî ye
Ev xweşikbûna yek dilî ye
Ji çar dîwaran me aso anî der
Xayîz mane çiya diponijin
ka çawa sibat teqî ?
Dilên pêhlewan perestin li vejîna te
Sîtavên ronahiya te, me dorpêç dike
Her ku dipijiqe kîn, lanet dike roja tarî
Dilerizin peyv, bûne ewirên girnijînê
Derbeder kirin gelê me
Huçikên dilên me tijî nifir bûne
Weke sêwlekên şevan, digerin li mala me
Rojhilat e, birîndar e, tevzinoka axeke sor e
Cudî, kulîlkên xwe sipartiye bextê Adarê
Wê were ew roj sibat xwe berzûrî ronahiya te bike
Şerm bike ji panzdehê canê xwe
Ev roj qolinc e, û dîrok dinale
Ma qey tê çi bibêje sibatê ?
Di gewdê cîhaneke rûreş de,
werîsên bêbextiyê digerîne li me

Rastiya feqîrtî û hejariya kurdan li vî perçî bandoreke xwe ya kûr li hestên wê kirin, taybetî kesayetên weke şehîd û hunermend Mizgîn, Seydayê Cegerxwîn û hunermend Mihemed Şêxo. Ev yek bû sedem ku bi rêwîtiya helbestê re tevlî riya tevgera azadiyê bibe.

Helbest

Helbesta ku mirovan nede kenîn
Nede girîn ..nede hizirandin
ma ew çi helbest e?
Helbesta nebêje:
Tu kî yî? ez kî me?
nebêje:
ev av e ..ev ax e …ev jiyan e …ev azadî ye.
ma ew helbest, çi ye?
Helbest , ne peyvên xemilandî ne
ne peyvên hilbijartî ne
ne jî dirêjahî û kûrtahî ne
Helbest wate ne
Helbest jiyan e
tişta wendayî vedigerîne
Ê dîlgirtî, serbest dike û tîne.

Axa Çavên Min

"Dayîka Eyşê şehîda zindî,
mîna zindîbûna axa Qendîlê"
Li kîjan waran tu li min digerî?
Li nav kolanên sar û reng derewîn?
Li dora bejna avahiyên bê ax?
ne dûr im...
nêzktirîn ji awirên axê me
Pirsa min dikî?
Pirsa jineke nav xeyalên rût dikî?
Li vî warê...
Li nav mêbûna çinarên bedew...
bêhin beybûn im
Zinar û latên şewat, mitêla min in
Ji te re behsa destanê rondikan nakim
Rondik bûne ax
Axeke sor...
Avbûyîna xwe jibîr kirine
janên evîna welat
Ji wê axê dibarin
Niha.. li van van bîstikên dijwar
Nobedariya hinaseya mirin û jiyanê dikim
Li ber dengên tank û topan
Li nav bêhna bartûta mirinê
barana axa çavên xwe rêz dikim
Xwenên zarokan neqiş dikim
Zarokên pêxwas
Yên ku şûna bêhna sînga germ...
hilma napalmê vexwarin...
vexwarin.
Li nava hesretan çavên xwe nuxumandin
Hîna ez jî ew zarok im
Pîxwas im, li pêlava xwe ya wendayî digerim
digerim…digerim
Tenê jibo bîstikekê jî
axa bin piyên min
nebêje: ax… ax… ax…
Rêwî be …
Li bin barana axa çavên min
dilê xwe bişo
bila têr vexwe eşqa evîna azadiyê
Tû hîna digerî...?!
Li nav avahiyan megere
Li jora bilindahiyên xezalan me
Hîna rêving im
Warê aramiya barana axa çavên xwe bibînim
Ger tu hîna digerî...
Li solên zarokên Helebçayê digerî...
Li qêrînên kulîlkên agirê sînema Amûdê...
Li hêviyên zarokên Amedê digerî...
Li Qendîla berxwedanê...
Li Lewcê û Zergelê a birîndar digerî...
Li wan çar sêwiyên bê dê mane...
Qîr kirin.. gava firok, giyanê dayika wa bir
Eyşê jinekî can bû
Dayikeke dilovan bû
Bêrîvana kûwêstana bû
Ne şerker bû
Di şeveke bêbext…
Li nav xwînê de xatir xwest
Û şehîd çû
Ew şehîd ket, û dilên çar zarokan
Li pey xwe şehîd hêlişt
Li qîr û hawarên buhara dûwazdê adarê digerî...
Bigere ….rêwî be…
Li xwe bigere
Li axê
Li jiyanê
Li helbestê
Tê tenê nav mêbûna axa çavê min de
bibînî

Bû weke koçeran ku konê xwe li her devera ku bi ava azadiyê pêwîste bê avdan geriya. Bi baskên firînê re fêrî rastiya azdiyê bû. Di kîjan şert û mercan de derbas bû her dem pênûs û helbest hevalên wê yên herî dilsoz bûn.

XEZAL

Hîna li wê derê
berî roj biçe ava
berdewama êşên dizîn
mîna xunavka rû bedew
temenê minî mayî
tu dibînî çawa?
diçe bîskê bin dara çinarka hejar
hîna jî bêhna şimamok û ember
bizrika rêwika şevê
de...were xezal
dê… were...
were û neçe paxila biyaniya
rake kavilê dilê tînî
bi xwe re rake biharekê
tê bîra te?
gava digevizin,
kenê me
ser tenûrê.
û ji destê me,
dirijî bendikê rêvînekê
tê bîra te?
libka tûwa mirî
bin awirekî zarokatî
û hîna xewa xwe
ser qelşê beşûş kolaye
de...were xezal
dê...were..
De were, û bihêle kewa hesûd biqeşite wir
tê bîra te?
bilûra Zozanê
"HİSÊN" ê şivan
karikek li wir
yek li vir
Bilûra mirûza,
bayê sehara hênik
de… were xezal..
dê… were
Were bo nemelisim
bin rehma girêza çeqela
bo nebim goriya,
hilma celadê çavreş
bitenêbûn, dawiya evînê ye
hîna dengê te,
pey destê min e
dest jî bi xwe dakiriye
kirasê şeva dawiyê
ya dawî bû gelo?
nezanim...na...
nezanim
êhh...
de… were xezal
ê...dee … weree...
Ger tu neyî
wê werin

û bidarvekin dil
dilketiyê dîtna te me
dilsar me be,
de … were xezal
ê … de … were … were...
Ser riya gurbetê
roviya qîçkirin diran
dûcanê yek rêkê,
ketin xofa bekoyan
de … were … xezal
dê … were...
Were, bila evîn
mizginiya diyarê min be

Di helbestê de azadî dît, di pênûsê de berdewamkirina rêwîtiya azadiyê dît. Her behsa wan pirpirîkên ku di nava agir de şehîd bûn. Rêhevalên wê yên hêja û binirx.
Di jiyana xwe de helbest ne tenê weke nivîsê jiyankirin dît, lê belê rastiya heqîqetê di jiyana wê bi xwe de dît. Piştî rêwîtiya bi salan heta niha jî li Rojava hîna li wateya jiyana azad di nava gotin, çîrok, pexşanên civaka xwe de dibîne.

Xweziya Min

Her dixwazim marek bim…
Xwe têr li darê welat bialînim
Her dixwazim darek bim..
Marê welat, xwe têr lê bialînin.

PENABER

Di şeveke tarî de
pekî destê min
herdû dilop
hilweşîm bi ser,
em bûn gul
Di şeveke tarî
ji ezman bezî
bû kulîlka,
xweliya min
bûme ava wî
em bûn bihar
Di şeveke tarî
bû çend çirûskê,
bingehê derya xizaniyê
bûm navê wî,
û birêketin dest pêkir

Sirûda Gunehê

Ji zemîna tevahî sirûdan
Û şewata xençeke axîn
Ji nav nûpelkê germebayê
bîrên ser rûkê mişextbûyî
Mayîn û nemana nêrgizan
xaka razayî û bêberge
Çend bi çend tarîkên
kevizgirtî man di êvarên
avisî pîç de
Ez û tu yê ku bûne
her tabloyên awarebûnê kolanan
Gundê me jî me jibîr dikin
û em bêriya xwe dikin
Her ku xerîbî ji me jêdike
Perçeyê zemîna sirûdan
em bendewarê sirûdeke dîn in
bo bide jibîrkirin
Nasnameya gunêhên me..

Pirtûkên Nêrgiz Isma'îl:
Pirtûka Xelata Xewna Min – Hisret – Mêşîn li çapxaneyên çiyayên azad hatine çapkirin.
Pirtûka pexşana ya STÊRVANA li Rojavayê Kurdistanê hate çapkirin.



www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Hunermend Şefîq Bavê Re`ed:
Min Ji Gelek Partiyan Re Gotiye: Eger Hûn Bibin Yek Ez Amade Me Xwe Li Ser Dika Şanoyê Bikim Qirdik.



Hevpeyvîn: Qadir Egîd

- Di meh û nîvekê de min Qurana Pîroz xitim kir û di sala ku ez ketim dibstanê de ez bûme pola çaran
- Hunermendên navdar kîn davêtin min, digotin ev ê "Hebezbenî" ji me navdartir bûye
- Yekem şahî bi awayekî fermî min lêxist di sala 1973an de bû li gundê Riçabiya, yê mala şêx, û saz û awaz li wî gundî qedexe bûn.
- Ji nifşê nû ez li Şeyda û Sefqan guhdar dikim.
- Hevalên min yên partî ji min re gotin nabe tu xwe bispêrî P. Celîlê Celîlî, bazirganiyê bi filiklorê Kurdî dike, ew dizê filiklor e.

"Ez Şefîq im bi navê bavê Re'ed têm naskirin, bi xwe xortekî kurd im, ji Kurdistana Bakur im. Me xwe li vê derê dît û em li vê derê mezin bûn, di sala 1948an de jidayik bûm, xwendina min ta pola 4an e, bavê 8 zaroka me, tembûrvanê heremê me, wilo hatime naskirin"

- Tu çawa hînî kultor û filiklorê kurdî bûye, te çawa ewqas kultor û filiklor ezber kiriye?
Ez zaro bûm temenê min 8 sal bûn xalekî bavê min hebû jê re digotin Ûnisê Çelebî, tembûrvanekî ser asta Kurdistanê tev de navdar bû, tembûrvanekî bi nav û deng bû ez bi zaroktî bi bavê xwe re diçûm cem. Di dawetê de, dawet sekinand û hat pêşiya bavê min, çend fîşek berdan, kêfa xwe jê re anî û hevdû maç kirin, got ev kurê te ye xwarzê, bavê min got erê, bi ser min de daqûl hat, ez maç kirim, got kêfa te ji tembûrê re tê? Min got erê, destê xwe li pişta min xist got tê bibe tembûrvan, ez bi gotina wî germ bûm, hema biçûkanî jî min destê xwe wilo dikir, wek ez li tembûrê bidim. Wextê min rahişt tembûrê di roja pêşî de min 3 awaz lêxistin, xwediyê tembûrê matmayî ma, got bera ji te re be tê zû fêr bibî.
Di 3 mehan de ez bûm tembûrvan, di warê hunera şahî û govendên kurdî de milet nema rê da min ku ez jê derkevim. Min xwe di helbestên dîrokî de gelekî nedît, ji ber ku xelkê rê neda min, hema min xistin warê şahiyan de û bi vî hawî min berdewam kir.

- We karê xwe yê şahî û ahengên kurdî çawa dişopand, ew şahî çawa bûn?
Şahiyên me yê berê gelekî xweş bûn, ez wan di ser yê niha re digrim, ana 2 - 3 saetan dîlan dikin û hew, berê her ahengek 7 şev û 7 rojan min bi tenê lêdixist, berê ev nazikî û paqijî tunebû jî, em pê kêfxweş bûn, û me bi vî rengî jiyana xwe derbas dikir

- Amûrên we yên mozîkê çi bûn û we çawa ew diafirandin?
Tembûr bûn, ez bi xwe ne ji bav û kalan de sazbend im malbata me bi xwe saz qebûl nedikir, tembûr tenê kêfa min jê re hat û ket nav lepên min de û min xwe fêrî wê kir.
herweha kemançe, def û zirne jî hebûn, min xwe nêzîkî van tiştan re nedikir.

- Gelo hîn tiştên filiklorî di tûrê bavê Re'ed de veşartî hene?
Tiştên filiklorî ên hilandî ên pir hene, ji wan ew tiştên ku ana nema kesek dibêje, me ji wan re digotin meqamê Hêlanê, wextê keçik di rojên cejnê de diketin hêlanê û hev dû dihejandin, meqamê Destaran, û Paleyê hebû. Di şahiyan de meqamê Koçerî jê re dibêjin Narincok, lê di vê demê de hatine pêçan û hilanîn, nema tên gotin.

- Ku Bavê Re'ed nebana hunermend di dilê xwe de dixwest bibe çi?
Rewşê ez kirim hunermend ku ji wilo xweştir bana ez ê bibama alimek li gor ku ez texmîn dikim, di meh û nîvekê de min Qurana Pîroz xitim kir û di sala ku ez ketim dibstanê de ez bûme pola çaran, yanî hişê min ji xwendinê re pir xurt bû, niha jî zarokin min hene, gelek ji wan re dibêjin win li bavê xwe nehatine, yek ji wan hunermend, nivîskar, xweşnûs, şêwekar û wênekêş e, bi destan wêneyan çêdike, û her sê dî jî niha karê hunerê dikin, ji min fêr bûn û li min zêde kirine, ez dibêjim ku ez nebama hunermend belkî ez bubama zanyareke xurt xurt.

- Gelo piştî çend salî ji kar û xebata hunerî hûn hatine xelatkirin?
Berî du salan mamoste Derwêşê Xalib di Komîta Fêrbûna Zimanê Kurdî de hevdîtinik li mala Konê Reş bi min re lidar xist û got nêzîk ne dûr em ê te xelat bikin, hîn ciwanî bi te re heye em ê te xelat bikin.

- Hunermend Bavê Re'ed helbestên kê ji helbestvanan te kirine sitran?
Seydayê Cegerxwîn rehma xwedê lêbe ew û birê min ê mezin hevalê hev bûn ji damezrênerê partî bûn, û kêfa min gelekî jê re dihat û carna em bi hev re rûdiniştin, lê mixabin ez vala nedibûm ku helbestê wî bikim stran.

"Guhek min deng jê nayê min, ji ber ku zilamê rêjîmê buks lêxistin û perda guhê min qetandin, û ta nehiştin ez her ser textor jî. Sedema girtinê jî ku kesine xirab di min de hildabûn û gotibûn Şefîq kesên ku ji leşkeriya rejîmê direve, ew wan derbas dike Başûr ta ku tevlî şoreşa Berzanî bibin"

- Tê bîra te şahiya yekem ku hûn çûnê, û we çiqas buhayê wê şahiyê stand?
Bi rastî destpêka min ne şahî bûn, destpêkê ez diçûm şahiyên piçûk yê dost û hevalan, mîna xwestin, xelat, sinetkirin, û şevbuhêrk. Lê yekem şahî min lê da ya min bû. Dûv re ez navdar bûm, vêca hunermendên navdar kîn davêtin min, digotin ev ê "Hebezbenî" ji me navdartir bûye. Lê tê bîra min yekem şahî min lê da, ya dostekî min bû, bi zorê çil wereqeyên Sûrî dane min. lê yekem şahî bi awayekî fermî min lêxist di sala 1973an de bû li gundê Riçabiya, ew jî gundê mala şêx bû, û saz û awaz li wî gundî qedexe bû. Wê rojê min ta se'et nehê bi

şev ji xortan re lê da, lê ji nişka ve min dît diya zavê hat, bi noqa min girt û min bi zorê bir nav keçan, min ji se'et neh ta deh û nîvê şevê li cem keçan jî lê da, dûv re ez rawestiyam û min ji keçan re got: Li min guhdar bin, em hemû xweşk û birayê hev in, eger hûn werin nav xortan ez ê berdewam bikim, lê eger hûn neyên, ez careke dî nema ji we re lê didim.. ji min re gotin bimeşe û em li dûv te, û min ew bi xwe re birin hewşê nav xortan û govenda keç û xortan lidar ket..

- Di wî demê de, rêjîma Sûriyê astengî ji karê we re çêdikirin?
Me ti car hesab nedikir.. carekê em xort li hev civiyabûn, ji nişkave hindekan li derî da, min vekir, min dît ku "Mekteb sanî" ye, ji min pirsîn ev kî ne, min got, heval û cîranê min in, ji min re gotin ev cara dawî ye ku tu civînê wisa çê dikî..

- We şahiya kîjan kesayet yan malbatên navdar di deverê de lidar xistiye?
Xelkên gundê Qoşanê û Til Erbîd, eger ne ez bama şahiyên xwe lidar nedixistin, herweha min şahiyên gelek kesên nîştimanperwer lidar xistine.
Min şahiyek ji bo kesên siyasetmedar lêxist, dema ku ji zindanê hatin berdan, ew jî di salên 1970ê de ji bo cejna jinê hatibûn girtin.

- We çend albom tomar kirine?
Çar kasêtên min tomarkirî hene, yek ji wan pêkenok e, yek bi zimanê Erebî û Kurdî ye, yek dîlana Şêxanî ye, û ya dawî dîlana Kurmancî ye. Min her çar di şevekê de li tomargeha Efrah tomar kirin, guman dikim ew jî di sala 1987an de bû. Lê yên li mala min gelek tomar kirine.

- Tiştin balkêş ku di şahiyan de bi we re derbasbûne,"pêkenok bin, yan jî xemgîn bin"?
Wexta ez zaro bûm, ez di ser serê 4 keçan re bûm, cîranê me gelekî kêfa wan ji min re dihat, yek ji wan hebû her dem min radihiştê û stran ji min re digotin, piştî ez mezin bûm carekê ez çûm gundê Sinceqê ta ez şahiyekê lêxim, li wê şahiyê jinek pîr hebû, beramberî min rûnişt, û ma zîq li min dinerî, dawî piştî min pirsî min nas kir ku ew pîra han cîrana me ya gund bû, ya ku min biçûkanî radihiştê, û bihîstibû ez ê werim, hatibû li min temaşe bike.

- Hûn çima niha stranên di tûrikê xwe de carek din tomar nakin, yan jî wan bixin bi dîmen"Vîdiyo kilîb"?
Ez qet ji bo dana hunerê çavtengiya nakim, kî bixwaze ez bêberamber didim, gelek heval ji min re dibêjin mala te navenda çandê ye, herweha nifşê nû tên û yê kevin jî. Gelek nifşên nû hene, qenciya min jibîr nakin, min gelek fêr kirine û alîkarî bi wan re kiriye.
Ji xwe ji dibistana min sê pispor hene,li min zêde kirine, her sê jî zarokên min in.

- Ev bû 6 sal ku şoreş li sûriyê û li Rojavayê Kurdistan lidar e, hûn di ahengan de ne amade ne, gelo çima?
Bi rastî ez pir westiyam û zordarî li min bûye, ez di bin işkencê de mame, û min lêdan xwariye, û niha guhek min deng jê nayê min, ji ber ku zilamê rêjîmê buks lêxistin û perda guhê min qetandin, û ta nehiştin ez her ser textor jî. Sedema girtinê jî ku kesine xirab rapor bi min hildabûn û gotibûn Şefîq kesên ku ji leşkeriya rejîmê direve, ew wan derbas dike Başûr ta ku tevlî şoreşa Berzanî bibin . herweha dihate gotin ku ez xelkê direvînim Başûr.
Ji ber ez serbixwe me, ez xwe diparêzim, ez gelekî westyame, min 22 salan xizmetiya koma Botan kiriye. Niha ger hemû bibin yek, ez amade me ku ez tev li her tiştî bibim.. ez her dem lava dikim ku bibin yek û bera ez bibim qurbana wan. Min stranek amade kiriye tê de dibêjim ku dermanê me yekîtî ye, min gelek tişt tê de xwestine lê tu kes li min guhdar nake.

- We ji bo vê şoreşê û pakrewanê vê şoreşê hin stran çêkirine?
Ez pir alîkar im di vî warî de, min stranek li ser Kobanî çêkiriye ew jî ji gotin û awazên min in, lê dibînim strana min cihê xwe nagire. Min strana xwe pêşkêşî kenala Ronahî kir, ji min re gotin tiştekî din ji me re bêj, gelekan li ser Kobanî nivisandiye. Dibe ji ber ku min tê de behsa Pêşmergeyan jî kiribe nehatibe qebûlkirin.

- Ku hûn bi tena xwe dimînin, hûn li kî guhdar dikin?
Gelek hene ku li wan guhdar dikim, ez bêtir li Mihemed Şêxo guhdar dikim, me bîst sal bi hev re hevaltî qedandiye, min ew bi Rif'etê Darî da nasîn. Ji nifşê nû ez li Şeyda û Sefqan û hevalê min yê ji gundê Refrefa û ku navê wî Bavê Salar e guhdar dikim.

- Şîret û qewîtiya te ji nifşê nû re ku riya hunerê şopandine?
Ew çiqas pêşkevin divê filiklor û keleporê kurdî ji bîra wan nere, eger ji bîra wan here, wê Mihemed Şêxo û Cegerxwîn jî ji bîra wan herin. Filiklorê me pîroz e. li Ewropa tembûra hunermend Ûsivê Çelebî di mozîxanê de ye, nabe em wan jibîr bikin.

- Hemsalên te yên wê demê kî bûn?
Ez û hunermend Mihemed Şêxo hevalên hev yên nêzîk bûn, em ê salê ne, ez û Se`îd Gabarî du salan xweş bi hev re derketin şahiyan. Nezîr Mihemed hebû.
Ez gelekî nêzîkî mamoste se`ed Ferso me, kêfa min ji wî û hunera wî re tê, ew rengê Mihemed Şêxo dibêje, û cihê xwe di hunera kurdî de girtiye.

- Hunermendê herî baş, ku di fililor de şareza û serkeftî ye, di nerîna te de kî ye?
Yên berî min Ûsivê Çelebî bû, dûv re rehmetiyê Hizniyê Şêxî bû, û Se`îd Gabarî.

- P.Celîlê Celîlî ji bo te hat Rojava, çima tu pê re rûnenişt?
Rast e, di salên Heyştê de dema hat, ji Cegerxwîn û Hisênê Tofo re gotibû ez ji bo Şefîqo dageryame Qamişlo divê ez wî bibînim, lê mixabin hevalên min yên partî ji min re gotin nabe tu xwe bispêrî vî kesê ku bazirganiyê bi filiklorê Kurdî dike, ew dizê filiklor e, min jî bi ya wan kir, ji ber ez ji hêla hevalên xwe de xwedî bawerî bûm, lê ez pir poşman bûm ku ez pê re rûneniştim.

- Qedrê hunermendan li Rojava heye?
Carekê ez û hunermend Se`ed Ferso û Hisênê Tofo û Kamîranê Hesarî civiyan, me xwest ku partiyên me alîkariyê bi me re bikin, ji ber em nikarin kasêtekê ji xwe re tomar bikin, lê wan bi yek gotinê ji me re gotin: Eger hûn xizmeta me bikin em ê alîkariyê bi we re bikin. Me ji wan re got em nikarin xwe wek we bikin sed perçe, lê eger hûn bibin yek ez ê ji bo we li ser dika şano xwe bikim qirdik.

- Gotina te ya dawî?
Ji hunermendan dixwazim yek bin, bira bin, nakokiyan ji nav xwe hilînin, li hev rûnin û alîkar bin. Divê hunermend serbixwe be û xwe erzan neke.